

KULÛLK

kovara zarokan - kurdiska barntidning

XWEDÎ	Mala Kultura Kurdi & Jîna Nû
REDAKTOR	Zinar Soran
REDAKSIYON	H. Balta L. Polat M. Dehsîwar M. Lewendî
ABONETIYA SALÊ	Şexs 150 SEK Institution 200 SEK hejmarek 20 SEK <i>Ji bo welatên din mesrefa postê lê zêde dibe.</i>
ÎLAN	Rûpelek 500 SEK Nîv rûpel 250 SEK
POSTGIRO	503799-9
ISSN	503799-9
ADRES	KULÛLK Box: 152 16 161 15 Bromma/ Sweden
TEL/ FAX	46-8-8031357/ 8-801825

Hejmara pêşî ya Kulîlkê di sala 1980-yê de hatîye weşandin.

sal: 1997



hejmar: 50

Heval û hogirên hêja!

Em pir pê kêfxweş û serfiraz in ku em hejmara 50. ya Kulîlkê dighêjinin destên we. Ev ji bo kovareke zaroka ya kurdî xwedî cihêkî zor girîng û serbilindiyê ye. Ji ber ku zarokên kurdan weke zarokên neteweyên ku serbest û azad dijîn, nikarin bi awakî azad û serbest bi zimanê xwe kovarên xwe derxînin. Lê hemû asteng, zilm û zordestî wê nikaribe pêşiya pêşeroja zarokên kurdan bigre. Em di wê baweriyê de ne ku teva hemû zahmetiyan wê zarokên kurdan hewl bidin ku bi zimanê xwe yê şêrîn bixwînin û binivîsin. Di vî warî de çi bikeve ser milên Kulîlkê wê bi kêfxweşî pêk bîne.

Di 29ê gulanê de, li Swêdê, li xwendgeha Biskops Arnöyê bi beşdariya 23 nivîskar û wênekêşên edebiyata zarokan ku ji welatên skandînavya hatibûn, semînerê hate amade kirin. Semînerê 4 rojan ajot. Li ser navê Komeleya Nivîskarên Kurd Li Swêdê jî Zinar Soran û Mihemed Dewsiwar beşdarî semînerê bûbûn. Ev herdu heval, herweha endamên redaksiyona Kulîlkê ne jî. Di dema semînerê de, gelek xebat û berhemên hevbeş hatin çêkirin. Yek ji nav wan jî “*Jiyana Ferîd*” bû. Ev serpêhatiya li ser jiyana zarokêkî ku malbata wî ji neçarî ji Kurdistanê barkiriye û li Swêdê bi cih bûye hatiye hûnandin. Nivîsa vê serpêhatiyê ji aliyê Zinar Soran û Mihemed Dewsiwar ve hatiye nivîsandin; resmên wê jî ji aliyên du wênekêşên Samî (Laponî) Berit Marit Heatta û Kerttu Vuolab ve hatine çêkirin. Bi destûra wan, em beşê pêşîn yê vê serpêhatiyê di vê hejmarê de diweşînin.

Heta hejmareke din bimînin di xweşiyê de...

KULÎLK

JİYANA FERÎD

(1)

Ferîd û malbata wî li gundekî Kurdistanê dijiyan. Gundekî biçûk, lê pir şêrîn bû. Çemek di nav gund de derbas dibû û gund kiribû du tax. Der dora gund bi dar û baxçeyan hatibû xemilandin. Ferîd û hevalên xwe ji sibê heta



êvarê, di nav dar û beran de dilistin. Havînan gava dinya germ dibû, ew diketin ava çem û ajne dikirin. Eger ew zêde birçî nebana, xweşikî çûna malê nedihat bîra wan.

Rojekê çend erebeyên leşkerê dewletê girtin ser gund. Leşkeran li bavê Ferîd dipirsîn. Ji bo ku bavê Ferîd wê rojê ne li gund bû, ew nehat girtin. Piştî vê bûyerê êdî bavê Ferîd newêrîbû bi roj were nav gund û li malê razê. Ew li şikeftên nêzîkî gund dima. Her ji çend rojan carekê leşkeran dora gund digirtin û dixwestin bavê Ferîd bigirin. Rewşa malbatê roj bi roj xerabtir dibû. Jiyana wan ya malbatî ke-



tibû tengasiyeke mezin. Piştî demekê malbata Ferîd biryar da ku ji gund bar bikin. Ew demeke kin li bajarekî mezin man û pişt re jî hatin Swêdê, li wir cîwar bûn.

Ferîd heft salî bû. Wî bi zimanê zarokên swêdiyan nizanîbû. Loma jî, wî nikarîbû pêwendî bi zarokan re daniya û



bi wan re bilîsta.

Dema destpêkirina dibistana wî jî hatibû. Ferîd beriya ku dest bi dibistanê bike, dest bi kurseke taybetî ya zimanê swêdî kir. Piştî demekê êdî Ferîd dikaribû derdê xwe ji derdora xwe re bibêje û beşdarî nav zarokan bibe. Dilê wî xweş, kêfa wî di cîh de bû.

Dibistan wê roja duşemê dest pê bikira. Ew bi kêf û heyecaneke mezin li benda wê rojê bû. Şeva duşemê xweşikî



xew nekete çavên wî. Ew heta derengî şevê di nav nivînan de li dibistanê difikirî. Serê sibê diya Ferîd ew ji xew rakir. Taştê li ser maseyê amade bû. Ferîd dest û çavên xwe şuşt û dest bi xwarina taştê kir. Piştî taştê wî diranê xwe firçe kir û kincên xwe li xwe kir.


Roja Ferîd ya pêşî bû. Diya wî bi destê wî girt û wan berê xwe dan dibistanê. Mamosteya Ferîd li ser prensîbên giştî yên dibistanê dest bi axaftinê kir. Ferîd bi diqat li ma-

mosteya xwe guhdarî dikir.

Gava mamosteyê axaftina xwe qedand, şagirt ji bo bêhnvedanê derketin hewşa dibistanê. Diya Ferîd jî berê xwe da



malê. Li hewşê komikên biçûk yên zarokan çêbûbûn. Her çend zarok gihastibûn hevdu û komek pêk anîbûn. Hinek bi hevdu re dipeyivîn û hinekan jî dilîstin. Lê Ferîd bi tenê mabû. Hevalên ku wî nasdikir tunebûn. Kesekî jî rast û rast pêwendî bi wî re danetanî. Ferîd wê gavê pêtir xwe biyanî dît. Wî jî nedixwest bê sedem here nav komukekê û bi



wan re bi-peyive. Lê piştî bîste-kê, Ferîd lê hay bû ku şagirtê li kêleke hewşê weke wî bi tenê ye. Kesek li derdora wî jî tunebû. Diyar dibû ku hevalên wî jî tune ne. Ferîd

hêdî hêdî nêzîkî wî bû û bi swêdî silav lê kir. Bi silava Ferîd ew şagirt weke ji xewnê şiyar bibe. Wî silava Ferîd lê vege-rand û dest bi axaftinê kirin.

Navê wî lawîkî Peter bû. Ew swêdî bû, lê malbata wî nuh barkiribûn wê taxê. Ew jî weke Ferîd bê heval bû. Di demeke nêzîk de, wan gelekî ji hevdu hez kirin. Ew bûn hevalên hevdu yê herî nêzîk. Car caran Peter piştî dibistanê dihate mala Ferîd û bi hev re dersên xwe çêdikirin. Piştî wê jî li televîzyonê dinerîn û bi hev re dilîstin...

(Dûmahîk heye)

Nivîs: Zinar Soran û Mihemed Dehsiwar
Wêne: Berit Marit Heatta û Kerttu Vuolab

Şêx Rizayê Talebanî (1835-1909)

Mahmûd Lewendî

Gava ku di edebîyata Kurdî de behsa hîcîv were kirin pêşî navê Şêx Rizayê Talebanî tê bîra meriv. Çawa ku di edebîyata Tirkî de di hîcîvê de çiyekî xusûsî yê Namik Kemal û Zîya Paşa heye, di ya Kurdî de jî Şêx Riza ye. Bêguman xusûsiyeteke din a Şêx Riza ew e ku wî helbest û hîcîvên xwe bi Kurdî, Farisî, Erebî û Tirkî nivîsîne.

Şêx Rizayê Talebanî di helbestên xwe yên hîcîv de gotin û peyvên herî mustehcen bi kar anîye. Çi merivên hukûmetê bin û çi jî merivên wî bi xwe bin, kê neheqî an xetayek li dij wî an jî li dij xelkê kiribe, Şêx Riza bi hîcîvên xwe, bi rexneyên xwe çûye ser wan.

Şêx Rizayê Talebanî kurê Şêx Evdirrehman Talebanî ye. Şêx Riza di 1835'an de li hêla Kerkukê li Qirixê hatîye dinyê. Pêşî li ber destê bavê xwe xwendîye. Paşê ji bo xwendine çûye Kerkuk, Koye û Sîlêmanîyê. Şêx Riza di vê dema xwe ya xwendinê de ji bilî Kurdî, ziman û edebîyata Farisî, Erebî û Tirkî jî fêr bûye.

Şêx Riza di 1860'î de diçe Helebê, di wir re jî diçe Îstenbolê. Du salan li Îstenbolê dimîne. Paşê dîsa vedigere Kerkukê. Piştî ku bavê wî dimire ji Kerkukê diçe bajarê Koye'yê cem apê xwe Şêx Xeffûr. Goya apê wî soz daye wî ku keça xwe bide Şêx Riza, lê paşê nadê. Şêx Riza jî li ser vê yekê diqehere ji Koyeyê diçe Kerkukê û dest pê dike helbestan li ser apê xwe dinivîse. Mesela rêzek ji wan helbestên hîcîvkî weha ye:

*Mamekem qehpejine dewletî Şeddadî heye
Talihî rahber û bextî xuda dadî heye.....*

Piştî demekê Şêx Riza dîsa dixwaze biçe Îstenbolê, di 1866'an de diçe Erzerûmê û di wir re jî diçe Îstenbolê. Vê carê li Îstenbolê dikeve nav edîb û zanayan. Çi li Îstenbolê be û çi jî li derdorên padîşah be, di demek kurt de nav û dengê wî belav dibe. Wê demê wî çend caran şaîrê tirk Namik Kemal(1840-1888) jî dîtîye û tê gotin ku herduyan bi Tirkî li dij hev helbest jî nivîsîne. Şêx Riza nêzî heşt salan li Îstenbolê dimîne. Paşê di 1874'an de vedigere Kerkukê. Demekê li Kerkukê dimîne, pişt re ji karbidestên Kerkukê û ji hin malbatên mezin û şêx û axayên Kerkukê diqehere, ji Kerkukê bar dike diçe li Bexdadê bi cîh dibe. Hetta ji bo vê yekê di helbestek xwe de weha dibêje:

*Bem hale eger def'eytir biçime Kerkûk
Me'lûm e be merdî neriwawe le serim tûk .*

Dîsa di rêzeke helbesteka xwe de, ji Şêx Hesên re weha dibêje:

*Bo kerî îlan-î herb kird legel min Şêx Hesên
Seyrîken yaran çi gobendêkî gêrra em kere .*

Şêx Riza, Şukrî Fezlî û Cemîl Siddîq Zehawî çi bi Ere-bî û çi bi Kurdî gelek hîciv li ser hev nivîsîne. Tê gotin ku Şêx Riza welê li ser wan nivîsîye ku êdî herdu şaîran jî ji ber Şêx Riza pes kirine. Mesela Şêx Riza di rêzekê de ji bo Şukrî Fezlî weha dibêje:

*Pûre Şukrî besîye ba netgêm û şemet leq nekem
Dayke kêrxurut hewaley sûrî ser ecleq nekem*

.....

*Kone hîzî şarî Bexda lêm heram bê şaîr î
Ger kuzî xuşkit wekû eywanî Kesra şeq nekem .*

Dîsa di helbestek xwe de henekê xwe bi hin şaîran dike û weha dibêje:

*Çunkî şaîr zor bûwe lem esre da
Bote heşrî nêreker lem hucre da .*

Şêx Rizayê Talebanî di 1909'an de di 74 salîya xwe de li Bexdadê wefat dike. Wî li Bexdadê nêzîkî gorra (mezêlê) Şêx Evdilqadirê Geylanî vedişêrin.

Wekî me li jorê jî got Şêx Rizayê Talebanî bi Kurdî, Farisî, Erebi û Tirkî helbest nivîsîne. Ev helbestên wî hemû di dîwana wî de, di 1935'an de li Bexdadê hatîye çapkirin. Di 1946'an de ev dîwana wî cara 2. hatîye çapkirin.

Çavkanî:

-Elaeddîn Seccadî, *Mêjûy Edebî Kurdî*, Çapxaney Mearif, Bexdad, 1952, r:341-367

-Elaeddîn Seccadî, *Edebî Kurdî w Lêkolînewe Le Edebî Kurdî*, Çapxaney mearif, Bexdad, 1968, r:104, 159, 171

-Bursali Mehmet Tahîr Bey, *Osmanli Müellîfleri*, cîld:2, Meral Yayinlari, İstanbul, 1972, r:411 (*Di vê kitêbê de hatîye nivîsîn ku Şêx Rizayê Talebanî kurê herî biçûk ê Şêx Eudirrehman Talebanî ye, ew nêzî Silêmanîyê li Bazîyanê hatîye dunyê. Di 1326=1908'an de li Bexdadê wefat kirîye.*)

-Prof. Qanatê Kurdo, *Tarîxa Edebyeta Kurdî*, Weşanên Roja Nû, Stokholm, 1985, r: 23-26 (*Qanatê Kurdo jî ji bo buyîn û wefata Şêx Rîza nivîsîye: 1842-1910*)

-Joyce Blau; *Memoîre du Kurdîstan*, Editîon Fîndakly, Paris, 1984, r:127 (*J. Blau jî ji bo buyîn û wefata Şêx Rîza nivîsîye 1835-1910*)

MIJÛLÎ



Du çêlik ji nav wan weke hevdu ne. Ma hûn dikarin wan bibîne?

ÇÎROKA DÎK Û ROVÎ

Gênc û ciwanê kurdan
Sehkin vê çîroka han

Ya ji mêj ve hatiye
Bapîrên me gotiye

Min jî ji nû ve ew vejand
Kirasê kevin çirand

Ne vê salê sala par
Dîk û rovî bûn hevpar

Ku çapoxka gundê xwar
Ya ji sed salî beyar

Bikin genim û şînî
Bi zanîn û bi hînî

Dema ku bû payîz- cot
Rovî bergîl kirin cot

Nîr û halet deranîn
Misas û gîsin anîn

Rêgirt nav çopaxka bor
Da cot bike xet û dor



Bangkir hevkarê xwe dîk:
Wî tovî bîne şîrîk

Me ji bîr kir li malan
Her bîne wan çewalan

Dîke çilek perî sor
Çû genimê wek por

Li vegerê birçîbû
Tiştê bixwe nedîbû

Ji bil tovî hevparî
Vêca tev xwar bi xarî

Ta ku gîha bal rovî
Nema lib ji bo zevî

Rovî bi xar jê pirsî:
Ka ew tovê te anî?!

Dîk lê vegerand û got:
Min ew tov xwar, lib û cot

Hingê rovî engirî
Hiş firiya ji serî

Misasek tê de werkir
Dîk ji tirsê tîrek kir



Bû qîre-qîra wî ji dev
Li sersedê rabûn hev

Dawî çûne bal melê
Ku çarekin vê belê

Mele bi cib û şaşik
Ji wan re got bi sivik

Ka bêjin min bela xwe
Derd û kulê canê xwe

Rovî got em bûn hevpar
Me hevparîk kir diyar


Mele got we qencî kir
Pir çê ye, we başî kir

Rovî pêde çû û got
Me rê girt em çûne cot

Me ji bîr kir tov li mal
Dîk çû ku bîne derhal

Lê wî xwar û şûmî kir
Mele got: bê nevsî kir

Rovî got: min jî wek dîn
Misas avêtê bi kîn



Dîk ji tirsî tirek kir
Kir qîj qîj û şerek kir

Mele serê xwe hejand
Cibê xwe li hev civand

Berê xwe da rovî got:
Wa pêzewengê serqot:

Wilo te bê aqilî kir
Wê hingê dîk şadî kir


Gelî zarokên birêz
Hûn ji welat re ne hêz

Bi jîr û zan û merdî
Ne bi sert û dubendî

Bi hev re alîkar bin
Ne dexsok û neyar bin

Gelkî nedin ber dasê
Ku das nemîne asê

Çîroka min ji wer xweş
Ji apê we Konê Reş



(Ji pirtûka Konê Reş ya Şagirtê Bedir-Xan; Helbestê Zarokan 2)

Çîrokek ji Afrîkayê

ÇIMA GUHÊN KERAN DIRÊJ IN?

Dema Xwedê heywan çêkir û xwest ku nav li wan bike, hemû heywan gazî civînê kir. Xwedê ji wan re got:

- Niha ezê navê we bidim we û weha domand.

Tu, hevalê min ê qelew û zer, navê te “Şêr”; navê birayê te yê bi xêz jî “Piling” e.

Tu, çûka gir a ku dikare bilind bifire, bila navê te “Qertel” be. Tu heywana biçûk, bila navê te “Mişk” be.

Û tu çûçika çavgir a grover, bila navê te jî “Kund” be.

Xwedê bi vê riyê, nav li hemû heywanên biçûk û mezin kir. Mêş, morî, pisîk, mange, pîrpirik, kûçik, hesp û hwd.

Piştî ku hespê jî navê xwe girt, dor hate ser birazê wî yê ji wî biçûktir, kintir û bi rengê qehweyî bû.

Xwedê ji kerê re got ku bila navê te jî “Ker” be û domand:

- Mirov wê bi vî navî gazî te bike. Ma ev nav çawa ye, te jî vî navî hez kir?


- Ooo, belê! kerê got û bi kêf û eşq lotik da xwe û çû.

Xwedê ji heywanan re got ku divê hûn navên xwe ji bîr nekin û civîn bi vî awayî qedand.

Hemû heywana soz dan ku wê navên xwe ji bîr nekin û çûn. Ji bona ku ew navên xwe ji bîr nekin, wan navên xwe bi dengên bilind çend caran dubare kirin. Tenê ecela kerê hebû. Ew tenê li cihê xweş yê razanê û xwarina xwe dihizirî. Gava şeva din ku ker ji xewê şiyar bû; navê wî nehate bîra wî. Navê xwe ji bîr kiribû. Lê kerê got:

- De tiştêk nabe; bê nav jî mirov dikare jiyana xwe bidomîne. Xwedê jî li ser van tiştan nasekine.

Lê ev dîtînen wî rast derneketin. Roja din Xwedê yeko



yeko gazî heywanan kir û navên wan ji wan pirsî. Ji kerê pê ve, hemû heywanan navên xwe rast gotin. Li cem Xwedê, ziman di devê kerê de werimî; tu gotin ji devê wî dervediket. Wê gavê, Xwedê bi herdu guhên wî girt û kişand. Guhên kerê dirêj bûn û dirêj bûn. Û dûre jê re got:

- Navê te ker e. Ma tê navê xwe di hişê xwe de bihêlî ya na?

- Ixxx! xixix! Ixxx! Ihhh! ih! xi!

Ji ber vê yekê ye ku guhên keran weha dirêj in û heta niha jî dizirin.

Wergera ji swêdî: H. Balta

NAVÊ VAN HÊŞÎNAHIYAN BÎNÎVÎSÎN!



.....



.....



.....



.....




.....



.....



.....



.....

ZIMAN Û GRAMER

Amadekar: Zinar Soran

NAVDÊR

Navdêr, ew bêje ye ku kesekî, heywanekî, cihekî an tişteki diyar dike.

Mînak:

Lezgîn, pismam, zarok, bizin, defter, mase, gol, çiya, zozan û hwd.

1) SERENAV

Serenav ew navdêr e, ku tenê kesekî, heywanekî, cihekî an tişteki taybetî bi nav dike. Serenav her gav bi tîpên mezin tê nivîsandin.

Mînak:

Kurdistan, Berzanî, Şêx Saîd, Cûdî, Lezgîn, Mahabad, Amed û hwd.

2) HEVENAV

Hevenav ew navdêr e, ku bi awakî giştî kes, heywan, cî an tiştan bi nav dike.

Mînak:

Mirov, pez, deşt, kevir, rovî, xwendekar, mamoste, dibistan, bajar, gund û hwd.

PRONAV - CÎNAV

Pronav ew bêje ye, ku şûna navên mirov û tiştan digre.

Mînak:

1) Mizgîn dihere dibistanê. Ew swedî û îngilîzî dixwîne.

2) Çiyayê Agrî gelekî bilind e. Ew 5 165 m ye.

Du grûbên pronavên kesîn hene.

Grûba yekem

Ez

Tu

Ew

Em

Hûn

Ew

Grûba duyem

Min

Te

Wî, wê

Me

We

Wan


RENGDÊR

Rengdêr ew bêje ye, ku bi navdêre ve wesf, rewş, hejmar an rengê navdêrê şanî me dide.

Mînak:

Hespa beza. Kerê boz. Mirovê hejar. Xaniyê kevn. Porê reş. Gerdena dirêj. Rûyê grover. Çar xezalên kovî. Hemû mirovên kêrhatî û hwd.


Kîja heywanî xwe li paş dar û deviyane veşartîye?
Navên van heywanan binivîsin!



Kîja wêne li yê din nayên?
Navên van wêneyan binivîsin!



Ji vana kîjan tişt li daristanê nayên çandin?
Navên van tiştan binivîsin!



TİŞTEKÎ MİN HEYE TİŞTANOK

1- Tişteki min heye
Ji ard hûrtir e
Ji devê bilindtir e
Ew çi ye?

Bersîv:

2- Wî alî aş, vî alî aş
Di ortê de topê qumaş
Ew çi ye?

Bersîv:

3- Dikek e, dikvanek e
Çar mî ne, baraneke
Ew çi ye?

Bersîv:

4- Kalê rizî, dardakirî
Ew çi ye?


Bersîv:

HÛN PÊ DÎZANÎN?

Amadekar: Bavê Hêvî

Pirs 1:


Otomobîla A û B yê di eynê demê de ber bi hevdu têne ajotin. Di nav herdu otomobîlan de 120 km heye. Otomobîla A yê li ser 20 km û ya B yê li ser 10 km tên. Gava otobîlan dest bi ajotinê kirin, motorbisiklêtek jî ji cihê otomobîla A yê û li ser 30 km dest bi ajotinê dike. Motor çend caran dihere û tê, heta ku her sê dighêjin hevdu.



Gelo di çiqas wextî de cara pêşîn motor gihaşt otomobîla B yê?

Gelo motorê çiqasî ajot, heta ku hersê gihaştin hevdu?

Pirs 2: Di dikanekê de sê kûzîkên şekir hene. Yek ji bo şekirên qulpîkan e, yek ji bo şekirên zêrîkan e û yek jî ji bo şekirên tevlihev e. Li ser her kûzîkekî kaxetê-ke ku navê şêkir li ser nivîsî heye. Lê li ser hersê kûzîkan jî navên şaş hatine nivîsandin.




Gelo em ji kîjan kûzîkî û tenê şekîrê derxînin, em dê bikaribin navên şekîran yê rast li ser kûzîkan binivîsin.

Pirs 3:





Ji sê darîkan weke bêrekê hatiye çêkirin.

Gelo hûn dikarin tenê cihên du darîkan biguherin û bêrek ku devê wê li jêr çêbikin?



Bersîvên pirsan di rûpela 3 de ne.

NAVÊ VAN HEYWANAN BÎNÎVÎSÎN!



LÎSTIKÊN ZAROKAN

VEŞARTOK


Lîstika veşartokê bi çend kesan re tê lîstin. Piranî keçik û lawik bi hevdu re veşartokê dilîzin. Pêşî zarok li hev kom



dibin û *maka* lîstikê hildibijartin. Ew jî bi hejmartina gotinên dûrikeke lîstika veşartokê dihate tespît kirin. Yekî ya jî yekê ew dûrik digot û bi tilîka xwe ew kesên kom bûbûn dihijmart:

Yeko diko
Du naziko
Repe ziko
Şama quto
Êçê mêçê
Êla xêşê
Êl qotikê
ser pîrçikê

Gotina “pîrçik” li kê keta, ew cara pêşîn dibû maka lîstikê. Maka lîstikê li ber dîwarekî ya jî koka darekê destên xwe dida ser çavên xwe û heta bîsta dijmart. Di vê navbênê de yên din jî direviyan û xwe li derekê vedişartin. Piştî hejmartinê mak li wan digere. Gava makê yek ji wan didît, digot “min tu dît”. Herdu kes jî ber bi cihên ku mirov çavên xwe lê digirt direviyan. Kî berê bighata wê derê, destê xwe dide wî cihî û digot “sobê”. Ew kesê li dawiyê dima dibû mak û lîstik ji nû ve dest pê dikir.



BERSÎVÊN PÎRSAN

Bersîv 1:


Piştî sê seatan otomobîla B yê 30 km û motorê jî 90 km ajotine û ew gihaştine hevdu.

Otomobîla A û B yê di seatê de 30 km nêzîkî hevdu bûne. Loma jî, ew piştî 4 seatan gihaştine hevdu. Motorê jî di 4 seatan de 120 km ajotiye.

Bersîv 2:

Em dikarin ji kûzîkê ku nivîsa “Şekirin tevlihev” li ser hatiye nivsandin, şekirekî derxînin. Ger ew şekir yê zêrika derkeve, em dizanin ku kûzîkên ku navê “Şekirê Zêrikan” li ser hatiye nivîsandin ne yê şekirê zêrika ye; ew yê şekirên qulpîka ye. Kûzîkê din jî yê şekirên tevlihev e.

Bersîv3:



Bersîvên Tiştanokan:

1. Dû
2. Dev û ziman
3. Dest û pênc tilî
4. Derî

X A Ç E P İ R S

4



3


2

4


5

6

6



5



1




2



3

LÎSTIKÊN BI SIYA DESTAN

Hûn jî dikarin li ber ronahiya lampyê û bi siya destên xwe wêneyên wan heywanan çêbikin.



GELEK XWEŞ E KURDISTAN

Li çar hawîr ala me
Li dijmin e bala me
Wek nêgiz û gula me
Gelek xweş e Kurdistan.

Welat bihişta me ye
Zozan û deşta me ye
Ser mil û pişta me ye
Gelek xweş e Kurdistan

Tu ronîya çava yî
Tu wek hîva şeva yî
Welatê me teva yî
Gelek xweş e Kurdistan.

Mistefa Gazî

50 hejmariya Kulîlkê



Pîroz be!